I'm not a robot

# Kurtce mevlid i serif

Haberler Kürtçe İlahi Sözleri Her millet kendi dilinde söylediği ve aynı zamanda okuduğu kürtçe mevlit i şerif baştan sona kadar Hz Muhammed Sallalahu aleyhi vessellemin genelde yaşadıklarını veya hayatını anlatan manidar anlamı bir kaside şeklinde veya ilahi olarak güzel okunan bir hitap şeklidir. Şarkı değildir. Hatta Merhaba ile başlayan Süleyman Çelebi Mevlidindeki Merhaba ile başlayan bahirlerin aynısı ve tercümesi gibidir. Kürtçe Mevlid'in tarihi serüveni İlk olarak 568 yıl önce yazıldı. Belki bir çoğumuz Kürtçe mevlidi şerifi camilerde veya dini özel günlerde dinlemiş hoşuna gitmiştir. Bu nedenle okumak istiyen çoçuklarımız yada “mevlidi şerif öğreniyorum veya öğrenmek istiyorum” diye düşünüyorsanız sizler için kürtçe mevlüt nasıl okunur makalemizi hazırladık. Ayrıca kürtçe mevlit sözlerini Türkçe olarakta yazılı bir şekilde kolayca okuyabilirsiniz. Unutmayın öğrenmeniz için tekrar ve pratik çok önemlidir. Kürtçe mevlidi pdf olarakta sayfamızdan indirebilirsiniz. Aşağıda verdiğimiz Kürtçe mevlidi şerif metin duasını okuyan güzel grubun videosunu izliyerek veya dinliyerek öğrenebilirsiniz. İster evde ister camide yada misafirlikte sohbetlerde dahi okumanızda bir sakıncası yoktur. Mevlid, genellikle Resûlullah`ın doğum günü yıldönümlerinde belli makam ve tegannilerle okunan övgü, gazel ve kasîdelerdir. Kürtçe Mevlid-i Şerif, Kürt medreselerinde Kur’an-ı Kerim’i hatmeden çocuklara, Ahmet El-Hani’nin Nubihâr kitabından önce okutulur, çoğunlukla ezberletilir. Mewlûda Melayê Batê Destpêk: Hemdê bê hed bo xwedayê alemîn Ew xwedayê daye me dînê mûbîn Em kirine ummeta xeyr-ul beşer Tabi’ê wî muqtedayê namuwer Ew xwedayê malikê mulkê ‘ezîm Daye me mîrasa Qur’ana kerîm Dînê me kir kamil û ni’met temam Yanî da me Ehmed û dar-us selam Ew xwedayê bê nezîr û zulcelal Bê mîsal û bê heval û bê zewal Raziqê bê dest û pa û mar û mûr ‘Alîmê sirra ne gotî der sudûr Karî sazê bende û sultanê can Rahîm û rehman letîf û mihrîban Asîmanê bê sitûn Wî kir bedîd Suretê bê xal û xet wî aferîd Hêvîdarin em ji te şahê kerîm Îhdîna ya Reb sîrat-el musteqîm Nê ji me sûc û xeta tîn û sitem Lê ji te îhsan û xufran û kerem Ya rab îmanê di xwazin em mûdam Jêrê alaya muhemmed wes-selam Ger divêtin hûn ji agir bin felat Bi eşq û şewqek hun bibêjin es-selat Bûyin: Ger divêtin hun ji agir bibin felat Bi esq û sewq hun bibêjin es-selat Cûmle zeretê cîhan da ev nîda Kirne gazî pêkve gotin merheba (Not: Bu bölüm ayakta okunur) Merheba ey sirrê furqan merheba Merheba ey derdê derman merheba Merheba ey canê baqî merheba Merheba ey işşaqî saqî merheba Merheba ey alî siltan merheba Merheba ey kanê îrfan merheba Merheba ey şemsê taban merheba Merheba ey canî canan merheba Merheba ey qurret-ûl aynî xelîl Merheba ey xasê mehbûbê celîl Merheba ey rehmeten-lil-alemîn Merheba ente şefî-ûl mûznîbîn Merheba ey afîtabê bê zewal Merheba ey mahê tabê layezal Merheba ey bûlbûlê baxê wîsal Merheba ey eşînayê zûl-celal Merheba ey nurî xurşîdê xweda Merheba ey tû ji heq nabî cuda Merheba matlubê alem her tû wî Merheba ewladê Haşem her tû wî Merheba ey nura heq ra mazharî Merheba ey ewliyan ra serwerî Merheba hatî şivanê ûmmetê Merheba hat bo me nura dewletê Merheba ey bedrê alem ya mûnîr Merheba ey xelkê girtî destegîr Merheba siltanê cûmle embîya Merheba ey nurê çeşmê esfîya Ger divêtin hun ji agir bibin felat Bi esq û sewq hun bibêjin es-selat Xelasek: Bo cemî’ê muslimîn û salîhe Bo feqîrê Bateyî el-fatihe Kürtçe mevlidi şerif yazılışı ve okunuşuHemdê bê hed bo xwedayê alemîn Ew xwedayê daye me dînê mûbîn Em kirine ûmmeta xeyr-ûl beşer Tabiê wî muqtedayê namuwer Ew xwedayê malikê mûlkê azîm Daye me mîrasa Quranâ kerîm Dînê me kir kamîl û ni’met temam Yanî daye me Ehmed û dar-ûs selam Ew xwedayê bê nazîr û zûlccelâl Bê mîsal û bê heval û bê zewal Raziqê bê dest û pa û mar û mûr Alîmê sirra ne gotî der sudûr Karî sazê bende û sultannê can Rahîm û rehman latîf û mîhrîban Asîmanê bê sitûn Wi kir bedîd Suretê bê xal û xat wî aferîd Hîwîdarin em ji te şahê kerîm Îhdîna ya rab sîrat-el mûsteqîm Nê ji me sûc û xeta tên û sîtem Lê ji te îhsan û xufranâ kerem Ya rab îmanê di xwazin em mûdam Jêrê alâya muhemmed wes-selamGER DİVÊTİN HÛN Jİ NARÊ BİNNECAT Bİ EŞQ Û ŞEWQEQ HÛN Bİ BÊJİN ES-SELATKürtçe mevlidi şerif dinle Bert û bad her zaman û an û hîn Ey Mihemmed sed hezaran aferîn Ey şefîê darûyê her illetê Dîde û bînahîya vê ûmmetê Deste gîr û mistaxasê herdû kewn Bo gunehkaran penah û pişt û ewn Sallî ya rabbî ela xeyr-ûl beşer Ta hebin teyr û bi xwinin ber secer Ew hebîbê ronahîya heft asîman Herdû alem qalib ew ruh û rewan Xakî payê Ehmed ew beyt-ûl heram Lew şerîfîn zemzem û rikn û meqam Sallî ya rabbî êla xeyr-il wara Ma teşîr-ûş-şems fîs-seb?il -ûla Fexrê îbrahîm û ismaîl û nûh Mustafa ê ba wefa ê ba fitûh Ma rameyte îz rameyte gûşîdâr Destê wî destê xweda der kâr û bâr Sallî ya rabbî êla xetm-ir rusûl Ma yemûc-ûl aşîqûne fis-sibûl Ew kelîmê xweş newayê çerxî tûr Daxîdarê bo wî sîmayê bi nûr Ey şefî?ê sahibê alâyî hâmd Min hene bê hed Gûneh nîsyan û âmd Lê me hîvî wasîqe dê ez feqîr Jîrî alâya te bim roja êsîrGER DİVÊTİN HÛN Jİ NARÊ BİNNECAT Bİ EŞQ Û ŞEWQEQ HÛN Bİ BÊJİN ES-SELATHer kesê gûhdarê mewlûda nebî Dergehê mîzgînîyan dê li vebî Gotî wî peyxamberê alî sifet Mewlûda min her kesê mezin biket Ez şefîê wî me roja mehşerê Dê vexwût ew tasek ava kewserê Serfi mewlûda me yek dirhem fere Hemberê yek kohê zêrê ehmere Fî sebîl-îlleh bêbexşê ber feqîr Qedrê mewlûdê bizanin hûn kebîr Hem ji bo Bekr û Êmer hat ev xeber Hem ji Osmân û Êlî çêbun eser Dirhemek bêt serfê mewlûda nebî Xeyrek mezin ji bo hasil dibî Hem ji şêxan bû rîwayet ew xeber Şêxê kerxî Fexrê razî bâ dîger Her kesê hadir biket ew yek team Bâ bixûr û şerbet û qedrek temam Gazî biket îxwan û hilbêtin çira Bête xwendin mewlûda xeyr-il wera Têtê heşrê ew digel xelqê berê Yanî ba peyxamberanê enwerê Her çi bînit hindî tiştê xwarinê Dê mûbarek bit li ber vê xwendinê Bête xwendin ger li avê ê vexût Rehmi nazil cûmle ê îllet dibit Bête xwendin ger li yek sikke dirav Dê mubarek bit dirahîm bêne zehv Her cihê lê bête xwendin rehme lê Dê melek bêne tijî wê menzelê Xanîyê lê bête xwendin ev salâ Dê bibête ba isê def a belâ Bo xwûdanê zadî û bo hem nûşîn Her selatan dê bidine kerr û bîn Dafiê cûmle hesûd û çav xerab Der mezarê sehle lê redda cewab Pir kesan dîtin keramet û eser Ji xwendina mewlûda sultanê beşer Her wekî hatîye gotin bê hîsab Lê neşîm bêjim tâdwîlê Kîtab Qedrê mewlûdê nizanim bêjim ez Li yek hişyarbin dane bête cerge bezGER DİVÊTİN HÛN Jİ NARÊ BİNNECAT Bİ EŞQ Û ŞEWQEQ HÛN Bİ BÊJİN ES-SELATGirtî yek qebza ji nura xwe xweda Gotî wê kûnî hebîbê Ehmeda Hêj ne erş û ferş û kûrsî û qalem Hêj ne lewh û enbîyayê muhteşem Salîha tesbîh kirî nûra şikerf Şeş miet elf û çihar û bîst û elf Paşî bo wî çêkirin duwazdeh hîcab Her yekî xweştir ji yâdî der hîsap Qudret û ta’zîm û mînnet merhemet Hem seâdet hem keramet menzîlet Hem hîdayet hem nûbuwet rifete Ta ete yazdeh şefaet temmete Her yekî westabû têde çendî Sal Lê adet me sipare ilmê lâyezal Her yekî tesbîhekî xas û cudâ Daîmâ tesbîhê xwendin bo xwedâ Paşî avête çihar behrê mezin Wî xwedayê lâyezalê ins û cin Behrê nûsret sanî behrê merhemet Behrê qûdret behrê îrfan în hemet Çûn ji behrê merhemet ew hate der Qetre jê werya bi îlham ev qeder Sed hezar û hem çihar û bîst û elf Her yekî bû nebîyê dil şikerf Paşî wî çêkir nûra nâmûwer Cewherek lê kir nazer ew bû dûker Nisfê ewwel dayî çavê heybetê Nisfê sanî dayî çavê şefqetê Hem kelî ew behr û kef da û dûxan Kef buye erd û hem dûxan bu asîman Nivîka di çêkirin çarî çîz Erş û kursî û qelem lewhe temîz Hate emrê padîşahê lâyezel Malikê mûlkê celîlê zûc-celal Ya qelem binvîs bi emrê padîşah Ez çi binvîsim bi ferman ya îlah Qale uktûb lâ îlah illâ ene Hem muhemmed qasidê emrê mine Sacîdû bê hiş kirî sed salî dî Ser hîlîne got îlahî seyyîdî Ez dizanim lâ îlâh îllâ tûwî Ew muhemmed hemberî ismek bûwî Kêjke ya sultanê ba cud û kerem Padîşahê sermedê got ya qelem Ger nebûya ew muhemmed lewh û erş Min ne tânîne wucûdê ta bi ferş Ney tû ney cennet û narê mezin Cûmle eşya min ji bo wî çêkirin Mûhbetê hingavtî şeq bû ew qelem Ma li ser lewhê nivîsî dem bi dem Serxwoş û şûkranê wî navê şêrîn Paşî ba îlhamê rabb-ûl alemîn Gotî ewwel ya muhemmed es-selam Hem eleyke gotî rabbî lâyenam Da cewaben an hebîbê izzetê We eleyke es-selam û rehmetê Bûye sûnnet lew selam û radd û ferd Cûmle ehwal paşî hingî kirne erd Wî nivîsî pêkve ûmmet qencîkâr Cennetî û asîyan dê biçne nâr Ûmmeta Ehmed nivîsî ehlê nûr Ûmmet-ûn mûnzîbet-ûn rabb-ûn xafûr Cûmle î ehwalê alem pêş û kem Wî nivîsî bûrî û hişk bû qelemGER DİVÊTİN HÛN Jİ NARÊ BİNNECAT Bİ EŞQ Û ŞEWQEQ HÛN Bİ BÊJİN ES-SELATÇûn îradet hate sultanê refî Çêkitin Adem bi vê şiklê bedî Emrî hate goşê cebrail emîn Qebda ê bêne ji beyda ê zemîn Ew dilê erdê û hem hûsn û beha Zîneta meknûn û dûrra bê bîha Hatî cebrail û ba emrê letîf Çengekî axê ji wê qebra şerîf Girt û ba tasnîm û safî kir hevîr Têkveda heta ku ew qenc bû xemîr Bu wekî dûrra sipî wê seatê Xewta da der cûyîbarê cennetê Emrê cebrail kirî paşî cûnan Wî bi girê der zemîn û asîman Berr û behr û şerq û xerbê alemê Hate gêran hêj ne behsa Ademê Nê hezaran Salê çûne axîrî Ew nebî bû Adem hîj av û herî Paşî hingî xaliqê her sûretê Çêkirî Adem bi destê qûdretê Pif kirî ruhê xwe ew bû nazenîn Lew melek hatin ji bo wî sacidîn Bû xezîne ew ji bo dûrra yetîm Danîye pişta wî ew nûra azîm Paşî bir avête baxê cennetê Xeyrî darê jê bixwe her nîmetê Saf bi saf westane pişta wî melek Nazirê nûra muhemmed ew melek Gotî Adem ew melaîk bo çi her Wî li pişta min dikin daîm nezer Rabbê alem gotî Adem ey mûlî Tû ji bo nûra muhemmed hamilî Ew hebîbê min di pişta te zûhûr Lew melek têne temaşeyê ji dûr Gotî Adem ey xwedawendî felek Min divêt bêne pêş min ew melek Hem bi firmanâ xweda wê seatê Nûr ji piştê hate nîva cebhetê Hin di bêjin hate tilya şahidê Lê heqîqet her di zanitin xwedê Mislê rojê hatîye ew câ felek Hem teheyyûr Adem û hindî melek Gotî Adem ya rabb ew nûra qebul Maye tiştek gotî eshabê resul Gotî adem ya îlahî qencebêt Bête tilyan her çi maye min divêt Nûra Bûbekri diwastayê Emer Binsar û Osman di xinser misteqer Hate îbhamê dibên nûra Elî Şolê tilyan û cennet mûncelî Hate Hâwa û nezer da nûrâ saf Gotî ya Adem çi nûre pir şefaf Gotî nûra yek nebîyê mezine Seyîd û serwerî nesla min e Çûnkî bê emrê ji Adem bû zîhar Nûr ji enyê hate piştê bû sitar Nê ji darê xwarin herdûkân şêrîn Hûlle ê cennet ji bejnê da firîn Îhbîtû mînha cemî?en hate emr Adema dê bête vehlâkin bi sebr Der ser endîbê bi erdê ket girî Çendî salan rohnikê wî bûn herî Rohnikê wî şîn kirin dar û nebat Çûn di erdê ded û pa û mayê mat Pir girî û xweş girî bê hed gelek Newhe ê înna zelamnâ çû felek Rojekî ew der sûcudê bê mefer Pir girî û hem li erşê kir nezer Dît nivîsî lâ îlâhe îlâllah Bâ mûhemmed ba resûlahê şah Got bi heqqê an mûhemmed key te neqş Wî kirî bâ ismê xwe ber saqê erş Tû bi xafrînî min ê bêçare bê âh Hate cebraîl û bâ emre îlâh Ser hilîne Adema afwâ celîl Bo te hat û rabe ey zîba cemîl Hûrmeta navê mûhemmed an resûl Tewbeya te Bû qebûl û her qebûl Çûn ji Adem nûra muhemmed bû cûda Hate pişta şîs û burhan-il hûda Hate aslabê bîtûnê tahirê Qet nebû yek Jê xerab û facirê Fewqê Ednan tâ Ji Adem îhtîlâf Tê heya lew bi tifâqê ev mesaf Jêrê Ednan tâ bi Abdullah gûhist Bîst û yek babin hemî rast û dûrîst Hin yekî Ednan û Ma’d û hem Nezar Mûdr û îlyasin bîzan ey goşîdâr Mudrîke paşî Xûzeyme taze eyş Hem Kenân e paşî Nadir bû qureyş Malik û hem Fexr û Xâlib hem Lûwey Kab û Mûrre hem Kîlâb û hem Qusey Hem ji pişta wî Quseyî pâk û saf Ew emanet hate nik Ebdûlmenaf Hem ji nik Ebdûlmenaf ew mûxtefî Hate pişta Haşim ew nûra safî Hem ji Haşim bû emenet mûnqelib Hate bû mêvanê Ebdûlmuttalib Silsîlâ wî tâ bi Adem dâ û bâb Pêkve di biçne bihîştê bê hîsabGER DİVÊTİN HÛN Jİ NARÊ BİNNECAT Bİ EŞQ Û ŞEWQEQ HÛN Bİ BÊJİN ES-SELATHem ji Abdûlmuttelîb bû hamîle Fatîme hem mûdde teş bû kamîle Ji bo Abdullah bi hûkmê sabîqe Nûra Ehmed der cebînêş barîqe Mazharê nûrâ Mûhemmed hatî ew Pâk û nûranî mûeyyed hate ew Cûbbeyê Yehya di şamêdê nûmûn Sûfekî sipî hemî têkda bû xwîn Girtî xwînê cûbbe ê yehya çûnar Wê demê bû yek şehîdê bê şûwar Hişkê bû ew xwînê birin rûzîgâr Tâ wûcudê Abdullahê namîdâr Taze bû ew xwîn û mercân bune rêz Rahîbân got ay û way exbarê nêz Wextê rabit Ehmedê alî alem Nasixê tewrat û încil û sanem Hat xudanê seyf û Qurana mûbîn Xwinê Yehya bû nîşana wî yeqîn Lêk vegeryan hem sûal û hem cewab Way û weylê kefte nav ehlê kîtab Wan yeqî kir Abdullah hate wucûd Ba?adawet qast kirin qetla wî zûd Ger divêtin hun ji agir bibin felat Bi esq û sewq hun bibêjin es-selat Ehlê kizb û ehlê zûr û îftira Çendî carân hatine um-mûl qura Abdullah der hivzê sultanê wedûd Nûra Ehmed dafi?ê şerrê yehûd Abdullah mezin bu ba nâz û delal Canê Abdûlmuttalib ew meh û sal Xweş divê babê azîzê maderê Rohnîya malê û zîba esmerê Şikl û sîma mislê bedrâ asîman Nazik û ranâ û nûra xanedan Dîlber û mehbûb û şîrîn wek şeker Herkesî ew dî û dil lê bu duker Dohtî çâkanî kureyş û hem ereb Muntezir bun pêkwe bo wî roz û şeb Her yekî hîvî dikir ew bit qebûl Ba yekî wî qet neda meylâ wusul Bu di aza ew ji fikrî în û an Yumnî nûra Ehmedî bûba sîban Rojekî wî gote babê ey emîr Saeta ez biçme betha û sebîr Min ji piştê tê te der nûrek mezin Radibitê ser serê min ew ji min Ez di bînim minqasim bu ew duker Yek di şerqê yek di xerbê çuye der Têtê vehcespân û çapûk bide reng Têtê ser yek mislê ewrê taze reng Ez dibînim asîman buye dû şeq Radibit ew nurê ta bi heft tebeq Têtê veh-fil- halî zanalî maqam Ez dibînim têtê piştamin temam Seata rûnim li ser mehda zemîn Min acaîp têtê pêşmin aferîn Hem ji erdê têtê semê ev kelam Wî digelte Ehmed wes-selam Her çi darê hişkê ez çume binî Bu hîşîn kesk ji bekan pir xenî Bû sî û sewan li ser min nagîhan Ez ku çum bu hişk û bê belk û xûsan Ew remz û hale babo bêje min Gote babî rohnîya çavê di min Çavê min mizgîn l ite ey nazenîn Dê ji te zahir bitin şahê emîn Hêvîya min wasiqe Dê radibîtin Ekrêmê alem ji te peyda bitin Eşrefê mexlûk û siltanê cîhan Dê ji te zahir bîtin bê şik bi zan Min dîye der xewab û mame mûntezer Ehmed ji pişta teye canê peder Çûnkî Ebdillahê rabû pâkî zat Xweş li qetla wî cihûdan kir xebat Rahib û ehbar û hem ehlê kîtab Ji agirê kerbê hemî bune kebab Hatine heftê cihûd ez milkê şam Taze beyat best û ehd dane temam Cengî û merdê dila wer şûreger Pêkve xwarin sund û bestên taze şer Ta neêtê kuştin ew zîba heram Yek ji me naêtê ax û milkê şam Rahê sehra girt ewanê kîne dûz Mislê kûndê her bi şev çune birûz Zû gihîştin çune dorâ mekkihê Ketne bestan mislê ava bin kehê Da bibîn kengî dê bêtin firsatê Newbedar ketne kenarê heyşetê Rojekî wan di bi çolêde meşî Talibê neçîr û ahûyê xweşî Wan ku di raburî Evdillah çunan Ba tenê tenha bi çolêde rewan Firseta xwe dîn û rabun şûr û hesin Çun di payde mislê gûrê dev bi xwînGER DİVÊTİN HÛN Jİ NARÊ BİNNECAT Bİ EŞQ Û ŞEWQEQ HÛN Bİ BÊJİN ES-SELATHem di wê rojê li sedyê bu weheb Yanî babê Emîna alî neseb Çun seda hat û weheb lê kir nezer Hate Evdillahê qewmê xwînceger Refde gûrkek hate berxê newciwan Lê belê hişyare lê zîba şivan Nagîhan fikrî weheb di ji asîman Hate xwarê leşgerê rewhanîyan Xeybeyanê keksê puşî gulîzar Hatin û jêk rakirin ew tar û mar Terfetûl eynê cihûd berbat kirin Wan ji iqlîmê cîhan winda kirin Seata sirrê ji xeybê dî weheb Maye heyran û fe maye der eceb Çun ji Evdillahê dît ew sir û hal Xweş li lewhê dil nivîsî ev xeyal Ger qebul ket min daye wî Emîna Pak û masûmê hebîb û mûqîmaGER DİVÊTİN HÛN Jİ NARÊ BİNNECAT Bİ EŞQ Û ŞEWQEQ HÛN Bİ BÊJİN ES-SELATPaşî wê sirra azîm û nûr û tab Nazîlê qelbê weheb bu îttirab Çapûk û çespan vegerya hate mal Wî hîkayet got ji bo mala xwe hal Hem hîkayet ji bo zewcê weheb Hem keramet hem ji cenga bûl-eceb Gote zewce qence qasit bî ji min Rabî bî çî xanedana der mezin Bêje Evdilmittalîb min Emîna Wê li nîk zîba afîfa mûqîna Gotî Evdillah bi bitin ew qebûl Temşîyet dê bit û çê bît usûl Nazik û sîma xweş dîlber ewe Layiqê wî babê ta wî her ewe Hatî Evdîlmûttalîb kir ba xeber Hem di Evdillahi hûbbê kir eser Gotî dayê rabe ey zîba xîsal Zewceyê bo min bi xwaze bes delal Ba cemal û ba kemal û ba edeb Xweş eda şîrîn lîqa alî neseb Zu di rabu Fatîma dil şadî man Mazirê ber suretê gûlçehre kan Pir şepal û gûl rixanê taze eyş Sakînanê perdeyê alê qûreyş Dil newa û pêkve naz û qende leb Kes nedî şîrîntir ez binta weheb Emîna gûl bu di gûlzarê cemal Hûsnî û bê hed qad û qamet ittîdâl Dê çi bêjim ez cemal û marîfet Walidê Ehmed bese her ew sifet Fatîma dît û vegerya da mina Gote Evdillahê behsê Emîna Mislê wê nebûn şepal û nazenîn Nê di dînyê ne di firdewsa berîn Carîdî çu dît û ew nazik nîhal Lê vegera babetin herdû heval Hate Evdilmuttalîb rakir ji mal Çun ji babê xwestin ew ranâ şepal Weqîyek zîv û weqîyek zeheb Sed şitûr sed pez e wî dane weheb Sed beqer cûmle ciwan û samîne Bu hinarên pêkve nexta Emîne Hate Evdilmuttalîb vê seatê Kir tedarîk kar û barê dawetê Çêkirin zâd û teamam bil-eceb Hem qureyşî xwendin û hindî ereb Emîna xemlê ji rengê gûlşenê Zend û bazin rêştine ji rengê hinê Xweş newa û xweş eda hatin ereb Cuma bu ew şeb nehê mahê receb Wê şevê anîn nîkah û aqdê best Bûk û zava mane şerbet dane dest Der Mekkê meşhûrî bu ev gotina Evdillah zavaye bûke Emîna Hesret û kerbî hemî berbat kirin Wê şevê sed jin temamî jê mirin Bû û zava herdû çune xelwetê Şahîyane kefte baxê cennetê Zu di ridwanê vekir babê cinan Daketin dergehê nîran nagîhan Hur û xîlman û çem û teyr û nebat Hatine hemd û senayê xweş lûxat Ez demê can bexşî cîbrîlê emîn Mijde da ehlê semawat û zemîn Rabê mizgînî bibe ji mexlûqan re Ji asîman û erdê ta teht-es-sere Xûlxulê peyde bu der heft asîman Sewtê tesbîhê melek çu lamekan Hate xwarê Cebraîl û mijde da Keksê alâ yek li banê Kabê da Mijde da mexlûqê ha ê behr û ber Cûmle heywanetan zanî ev xeber Xweş nîda hat ez yesar û meymene Nura Ehmed hatî çu nîk Emîne Hatê nuranî şef-îl mûznîbîn Hatê xeyr-ûn-nasê xetmûl mûrselîn Wê şevê hindî sanem bun sernûgun Textê Îblîsê leîn buwa ji gun Lew li ser suret revî teşbîhê mar Hate gohê bo qûbeysê kir hewar Zûryeta wî cûnle hatin bê newa Ew çi hale bêje me wî gote wa Lew li min çêbuye tirs û zelzele Ba Muhemmed Emîna bu hamîle Hatî dewra Ehmedî dewra me çu Lat û İzza dê bikat bê av û ru Yek j ime êdî nehiştin bit eyan Wî li me rê girt çuna asîman Ronîya herdu cîhan û millatan Ummeta wî çêtirîne ummetan Hate xwin rêzê cîhan qir seffaq Em ji deste wî hemî dê bin helaq Dê çi bit halê me û tedbîr û ray Ay û way û ay û way û ay û way Hem di sûbha wê şevê dewlet fûzun Textê şahanê cîhan bun sernûgun Bê tekelûm ma devê hindî milûk Şah eger hakim eger mîrê bilûk Emîne gote şeş meh çune ser Min ji hemla xwe nedî qet yek eserGER DİVÊTİN HÛN Jİ NARÊ BİNNECAT Bİ EŞQ Û ŞEWQEQ HÛN Bİ BÊJİN ES-SELATPaşî şeş meh gote min awazê xeyb Min li te mizgîne Pakîze ceyb Wî digel te xatemê peyxemberan Nasixê herfa kîtab û defteran Lê di xewnê de me dîtin bê eded Enbîya û remz û nîşan û sened Ewwela min dî ji min nurek diçit Qesrê bûrsa min ji Eqsa wî didît Mahî ewwel hatî Adem teyyîba Kir selam û gote hemlê merheba Mahî sanî hatî Şît ez meymene Gote min mizgîn li te ya Emîne Mahî rabi Nuh û Xamis Hud û hem Hatine mizgînî da min ez kerem Mahî sadis hatî İbrahîm Xelîl Da min mizgînî ji wê hemlê celîl Mahî sabi hatî İsmaîl zebîh Mijde bexşî min ji wî hemlê melîh Mahê samin hatî Mûsa ba wefa İbşîrêya Emîne bil Mistefa Mahê tasi hatî îsa ji asîman Mijde da min hatî siltanê cîhan Ew ku şeş meh çun ji hemlê mûnqelîb Gote Evdillahê Evdilmuttalîb Ba ticaret dê biçita semtê şam Der Medîne bar bikî temr û team Wê demê dê Emîna godek bibê Yek ziyafet lazime dawet bibê Evdillah an meh û ruwê gûlîzar Der Medînê şerbeta mergê wexwar Emrê Evdillahê bîst û pênc û sal Burî û kir ji wê dinya îrtîhal Çun ji Evdilmuttalîb ew waqîe Herdu çavê Emîna bun damîe Esmerê min ma ji xelkê karîwan Hatine pey dane ew ruh û rewan Kan habîbê min dilê min bu dûnîm Ax û hesret godekê min ma yetîm Dar û ber bo wî girîn wê seatê Av û ronîk nedînê qet mûhletê Hem melek rabun û gotin ya kerîm Nê hebîbê te Mihemmed ma yetîm Malikê milkê ezîm da ew cewab Çêtirim bo wî ji xeyra dê û bab Ey xwedawendanê aqlê mûsteqîm Kes nizanit qiymete dûra yetîmGER DİVÊTİN HÛN Jİ NARÊ BİNNECAT Bİ EŞQ Û ŞEWQEQ HÛN Bİ BÊJİN ES-SELATEz rebî-ûl ewwela şeb ruşene Heştê şev burîn li helmê Emîne Ya nehê zail jbu ji tirs û xena Ya dehê bu mijdedar xîf û mîna Yanzde hem bu xûlxûl û awaz û hem Zimzima tesbîh û hindî der herem Diwanzde hem hil bu şemala dewletê Emîna mabu tenê der xelwetê Wê şevê der Kabê Evdilmuttalîb Mabu bo tamîra erdê mûxelîb Emîna got mam bi tenî bê mêr û jin Ez demek tirsam û lerze hat emin Min dî xanî ronî bu xayet belê Çarî jin hatin ji riknê menzelê Ba cemal û hisn û nuranî qemer Hûlleyê istebreq û sûndûs li ber Leleha têr ew ji ava kewserê Zûlfîha sed tena dane enberê Bejn û bala ser û sîmayê şefaf Min şibhandin tuxmeyê Evdilmenaf Yek li destê rastê hat û yek li çep Yek li pişt û yek li pêş min ba edeb Ew kî bun Hewa û Sara Asîye Yek li pêş min Meryema îmranî ye Meryemê hisn û melahat zêde bu Palveda bu ew ji bo min tekye bu Nagîhan bu zimzim û tesbîh û deng Ba lûxathayê muxtelîf reng û reng Rast û çep min di kewakip têk firin Qafê ta qafê cîhan bu enwerîn Pêkve dinya min dî buye qûrsê nur Meşriq û mexrib didîtin min ji dur Keskê alâ yek di xerbêda me dî Yek li şerqê yek li banê Kabê dî Emrê Cebraîl kirî mîrê mezin Mijde da ehlê semawat û zemîn Daketin dergahê nîran bê guman Şahîyane hur û wîldanê cinan Xûlxûlûn horî di qasrê cennetê Kî dizanit kar û barê qudretê Hatî Cebraîl melaîk fewce fewc Çar kenarê mekkehê bune mewce mewc Nagîhan ez tîhnî bum wê seatê Min dî da destê min tasek şerbetê Sipî û wek şîr şêrîn wek esel Nê ji wê şî û esel bune mesel Min wexwar û tîhnî çu filhal ji min Teyrekî sipî hat û per malî di min Wê demê min bu Mihemmed Mistefa Nura can û madena sidq û sefaGER DİVÊTİN HÛN Jİ NARÊ BİNNECAT Bİ EŞQ Û ŞEWQEQ HÛN Bİ BÊJİN ES-SELAT(Not: Bu bölüm ayakta okunur) Cûmle zeretê cîhan da ev nîda Kirne gazî pêkve gotin merheba Merheba ey sirrê furqan merheba Merheba ey derdê derman merheba Merheba ey canê baqî merheba Merheba ey işşaqî saqî merheba Merheba ey alî siltan merheba Merheba ey kanê îrfan merheba Merheba ey şemsê taban merheba Merheba ey canî canan merheba Merheba ey qurret-ûl aynî xelîl Merheba ey xasê mehbûbê celîl Merheba ey rehmeten-lil-alemîn Merheba ente şefî-ûl mûznîbîn Merheba ey afîtabê bê zewal Merheba ey mahê tabê lâyezal Merheba ey bûlbûlê baxê wîsal Merheba ey eşînayê zûl-celal Merheba ey nurî xurşîdê xweda Merheba ey tû ji heq nabî cuda Merheba matlubê alem her tû wî Merheba ewlâdê Haşem her tû wî Merheba ey nura heq ra mazharî Merheba ey ewlîyan ra serwerî Merheba hatî şivanê ûmmetê Merheba hat bo me nura dewletê Merheba ey bedrê alem ya mûnîr Merheba ey xelkê girtî destegîr Merheba siltanê cûmle embîya Merheba ey nurê çeşmê esfîya Ger divêtin hun ji agir bibin felat Bi esq û sewq hun bibêjin es-selat

Mevlidi şerif'in yazılışı ve okunuşu kürtçe.  Kürtçe mevlid-i şerif.  Mevlid i serif.